Ramanên qehremanekî: Xosrow Gulêsorxî kîye?

Kakşar Oremar
Email: kakshar_oremar@yahoo.de

Di nava şoreşger û qehremanên ku li dijî stemkariya rejîma Pehlewî xebateke berfireh danmeşandin nemir **Xosrow Gulêsorxî(1943-1974)** navekî naskiriye. Sala 1974an Tvya milîya Îranê bi armanca bednavkirina dijberên sîstema seltenetî dadgehkirina wî û hevalên wî çend roja li pey hev, belav kir. Şahidên wan salan dibêjin:**“ şêweya xweparastin, berxwedan û axiftinên Gulêsorxî û Kermetulah Danişiyan herkes xistibû nava fikir û ramanên kûr...., bêtirs diaxivîn û cesareta wan wisa mezin bû ku generalên rûniştî di dadgehê da bi çavên tejî tirs tenê li wan dinêrîn û guhdarî wan dikirin...“**

sala 1943an ew di nava malbateke hejar da, li bajarê Reşt(bakurê Îranê) hat dinê. Bakurê Îranê ji şoreşa sosyalîsta ya sala 1917an li Sovyet û pêda li hemû Îranê bi rewşenbîr û şreşgerên xwe yên sosyalîst ve herêmeke naskiriye.

Di dîroka azadîxwaziya Kurdên Kurdistana mezin da du nav hene ku berxwedana Gulêsorxî navê wan tîne bîra me: **Leyla Qasim û Mazlum Dogan**. Yekê li dijî Baasiyên xwînxwar û yê din jî li dijî zilm, nivşperestî, şovînîsim û înkara Kemalîstên cinayetkar berxwedaneke wisa kir ku ger rojekê wijdana mirî ya cîhanê ji xewê şiyar be, gere bi ava zêr di rûpelên dîroka mirovahiyê da bê nivîsandin û cih bigire.

Xosrow Gulêsorxî jî di dîroka azadîxwaziya gelên Îranê da xwedî rolekî wiha bûye. Ew ji nava xelkê hejar rabû, di nava wan da jiya û ji bo standina mafên wan jî canê xwe fîda kir. Ji ber wê jî ew hê bi raman û sedaqeta xwe di nava dilê xelkê da dijî.

Di wê dadgeha leşkerî da gelek hevalên wî tobename an jî nameya poşmaniyê îmzakirin û canê xwe rizgar kirin, lê wî sivkatiyek wiha nepejirand û bi dengekî bilind qêriya:**“ Bira, jiyan bedewe û ez jî weke her insanekî din ji jiyana bi**

gel û malbata xwe ra hez dikem, lê ez ji mirina di rêya gel da zêdetir hez dikem. Em diçin da ku rêya xebat û şoreşê bimîne....“

Di nava nivîskar û rewşenbeîrên Îranî da X. Gulêsorxî rojnamevan, helbestvan û rexnegirekî naskirî bû. Dema nivîs an jî rexneyên wî di rûpelên rojname, kovar an jî kitabekê da cih digirtin,ji hêla gel û zehmetkêşên civakê ve pir dihate xwîndin û ji hêla din jî êtlaata Îranê **„SAWAK“** dixiste nava liv û lebateke bêrawestan ku nehêlin bi rêyeke wiha ra bîr û ramanên wî di nava gel da belav bibin.

Xusrow ji zarokatiyê di nava êş û elemên gel da mezin bû. Zû bavê xwe ji dest da û dayik û bapîrê wî li ser torekirina wî sekinîn. Ji bo debara jiyana xwe hatin Tehranê. Ew bi roj dixeitî û heya direngiya şevê jî pirtûkên cûr bi cûr dixwendin. Çiqas ku zêdetir dixwend ewqas jî hem civaka xwe û hem jî baştir sîstema serdest nas dikir. Ramanên şoreşgerî û rêyên xebatê sal bi sal di mejiyê wî da mezintir dibûn. Ew di gotareke xwe da wiha dibêje**:“ Ti pirsgirêk ji rastiyên ku di civak û jiyana me da hene û em wan dibînin, mezintir nîne. Em bi wan pirsgirêkan ra rû bi rû ne. Tiştê ku kesên din derheqa huner û çandê da di labraturan da û di çaxê bê serêşiyê da nivîsandine, pêwîste bispêrîn muzexanyan. Em niha xwedî nerihetî û êşên xwe yên taybetî ne. Nabe em ji hinek kesên ku hejmara wan nagehe hejmara tiliyên herdu desta, binivîsîn. Nabe em bi çavên girêdayî li pişta navê vî û wî kesî, xwe veşêrîn û li dijî ,,tarîtiyê“xebatê bikîn. Divê ku çav, raman û wijdan bikevin gera xwe, bibînîn, bifikrîn û em li ser pêdivîyên civakê binivîsîn...“**

Gulêsorxî rojnamevanekî rastîn bû. Hurmeta pênûsê di destê xwe da pir digirt û derew û durûtî li cem wî karê cahêlan bû. Heza gel û şiyarkirina çînên civakê li ba wî girîng bûn. Ji ber wê jî tim di nivîsên xwe da dixwest ku rûçikê gemarê dijminên gel bêtir eşkere û bi gel bide naskirin.

SAWAK li derfetekê digeriya ku dengê wî kip bike. Ew nûxwaz û şoreşgerekî rastîn bû. Li ser rastiyên civaka xwe dinivîsî. Di dadgehê da jî ne xwe belkî berjewendiyên gel parastin û li ser wê tarîtiya bêsinor diaxivî ku rejîma şahenşahî li hemû Îranê kiribû pareke cudanebûyî ya jiyana xelkê. Gulêsorxî bû dengê hemû azadîxwazên ku heya hingî bêdeng bûn. Wî dîwarê bêdengiyeke çend sed salî şikand ku di sala 1079an da gehişte esmanan.

17ê sibata sala 1974an ew û hevalê wî anîn hewşa tîrbaranê û dema xwestin çavên wî girê biden, wiha got**:“ çavên min negirin, dixwazim ronahiya rojê**

bibînim...“ û dengê goleyên ku singê wî û K. Danişyan kun-kun kirin, xemeke giran di nava azadîxwazan da belav kir.

Ew şehîdekî rêya azadiya gel, rojnamegeriya rastîn û siyaseta bi dê û bav bû.

21. 02. 2009 Almaniya